

Testa xwe ya covid-19 bigire

Berya girtina testê qaîdeyên testgirtinê bi hûrgilî bixwîne.

Ji bo girtina vê testê divê nasnameya te ya elektronîk (e-nasname) hebe.


Eger e-nasnameya te tunebe ji bo girtina testê telefonê bide 021-17 30 00 û vebijarka 1 hilbijêre.

Amadekariyên girtina testê


Tiştên pêwist:

- E-nasname (E-legitimation)
- Kîsikê testgirtinê ku ev tişt tê de ne: tûpikê testê, şûşeya biçûk bi şorav, qotîka tifê û darikê testgirtinê.

Tiştên di kîsik de




- 1 Kîsik veke. Tûpik û şûşeya şoravê derîne.
- 2 Serikê şûşeya şoravê bade da vebe.
- 3 Şoravê têxe tûpikê testê de. Tûpik di dest xwe de bigire yan jî hêdiya deyne ciyekî.
- 4 Niha li gor talîmatên jêr van sê testan bigire.



Testê wiha bigire


Qirik – test 1

- 1 Darikê testgirtinê têxe devê xwe û heta ji te were bibe kûrahiya qirikê. Dêrik negihîne ziman, diran û goştê diranên xwe.
- 2 Darikê testgirtinê dora 20 saniyan bi herdu aliyên jêrê qirika xwe bihekîne.
- 3 Darikê testgirtina ji qirikê derîne.



Bêvil – test 2

- 1 Heman darikê têxe firnika xwe û 2-3 cm kûr bibe. Dora 20 saniyan li wir di nava firnikê de bihekîne. Heman tiştî di firnika din de jî bike.
- 2 Darikê testê ji bêvila xwe derîne û di dest xwe de bigire.



Girêz – test 3

- 1 Çend caran tif bike nav qotîka tifê heta ku tif binê qotîkê tam bigire.
- 2 Bi heman darikê testgirtinê ku te bi kar aniyê dora 20 saniyan girêzê tev bide.
- 3 Darikê testgirtinê têxe tûpikê testê û dora 20 saniyan tev bide.
- 4 Darikê testgirtinê ji tûpikê testê derîne û devê wê baş bişidîne.
- 5 Kontrol bike da şilayî di tûpikê testê de mabe û da devê wê baş şidandî be.
- 6 Tûpikê testê têxe kîsikê biçûk û devê kîsik asê bike. Tê vî kîsikî bişinî.



Rûpel biqulibîne ▶

Bermayyan bavêje


Qotîka tifê, darik û bermayiyên din têxe kîsikê mezin û bavêje çopê. Kîsik bavêje çopa normal ya malê ku çopa tê de dikare were şewitandin.

Testa xwe qeyd bike – têkeve malpera 1177

Agahdarbe! Ji bo qeyda hejmara testên zarokên bin 13 salî re tu nikarî koda QR bi kar bînî. Ji bo qeyda hejmara testên zarokên bi 13 salî re li agahiyên jêr binere. Eger e-nasnameya te (e-legitimation) nebe tu nikarî vê testê bigirî. Eger e-nasnameya te tunebe ji bo girtina testê telefonê bide 021-17 30 00 û vebijarka 1 hilbijêre.

Eger tu 13 salî û ser re bî tê wiha bikî

- 1 Koda QR bi kameraya telefona xwe yan jî aplikasyoneke QR skan bike. Li gor lînkê tê nîşandan tev bigere û bi e-nasnameyê têkeviyê. (Zarokên ser 13 salî re e-nasnameya xwe bi kar tînin)
- 2 Ji bo qeydkirina testa xwe li gor talîmatên mobîlê tev bigere. Hejmara tê nivîsê li ser etîketê ye. Eger tu bi mobîla xwe nikaribî koda QR qeyd bikî têkeve vê malberê: <http://pep.1177.se/testkit>



Weliyên zarokên bin 13 salî re dikarin wiha bikin

Weliyên zarokên 5-13 salî divê mîna **wekîl** hejmara testa zarokê qeyd bikin.

- 1
- 2 Webxwînekê veke û vê adresê binivîse <http://pep.1177.se/testkit>
- 3 Bi e-nasnameya xwe bikeviyê
- 4 Zaroka xwe hilbijêre (rewşa wekîltiyê)
- 5 Testgirtina bi xwe (Egen provhantering) hilbijêre Hejmara testgirtinê ya li ser etîketê qeyd bike.

Testa xwe bişîne analîzê

Piştî ku te ev nuqtayên jor hemî pêk anîn li gor agahiyên dema te kîsikê testê wergirtî tu testa xwe dişînî. Piştî te testa xwe girt heta ji te bê zû wê bişîne ciyê analîzê. Di vê malperê de dinivîse bê tu dikarî testê bişînî kî derê 1177.se/Vastmanland/sjalvprovtagning-vastmanland.

Bila ev belgeya rêberiyê bi koda QR re bi te re be heta ku bersiva testê ji te re were.

Bersiva testê

Di rewşa normal de bersiva testê di nava 48 saetan de ji te re tê, lê carinan heta 4 rojan wext dikare derbas bibe. Ji bo dîtina bersiva testê têkeve malpera 1177.se, li bin sernivîsa 'Egenprovhantering', pêl lînkê 'Beställ provtagning' bike û bersivê bibîne.

Eger te ji 1177.se îlankirin pejirandibe agahiya li ser bersiva testê bi riya sms an jî e-name ji te re tê.

Alîkarî

Ji bo pirsên teknîkî yên li ser **qeydkirina** testê têkeve <https://1177.support.se/oversikt/flow/38>

Ji bo pirsên li ser **têketina 1177.se** telefonê bide Navenda pêwendiyên 021-17 30 00 û vebijarka 1 hilbijêre. Rojên karî navbera saet 9-17 vekiriyê.